Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :801 07-Cotmeh- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Mezlûm Ebdê: Divê em destkeftiyên xwe bi serkeftinê tacdar bikin

Zana Deniz/ANHA -1

> Fermandarê giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê got, "Armanca sereke ya dewleta Tirk ew bû ku xaka me dagîr bike û bike Tirk. Ev êrişên dagîrkeriyê jî bi "Artêşa Nîştimanî ya Sûriyê ku ji çeteyên El-Nusra û DAIŞ'ê berhev kirine û di nava lîsteya terorê de ne, dan kirin."


Di ser dagîrkirina Serê Kaniyê û Girê Spî re salek derbas bû. Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdê diyar kir ku wê salê sûcên çeteyan yên dagîrkerî, guhertina demografiyê, asîmîlasyon û hwd baş hatine dîtin û bang li sazî û hêzên navneteweyî kir ku bikevin nava hewldanê.
Ebdê bal kişand ser peymanên bi Emerîka û Rûsyayê re yên di pêvajoya dagîrkirina herêmên navborî de û diyar kir ku ew dewlet berpirsyariya xwe bi cih naynin û ji wan xwest ku berpirsyariya xwe ya garantoriyê pêk bînin.
Mezlûm Ebdê li ser dagîrkirineke nû ya muhtemel jî wiha got: "Çi dema dewleta Tirk firsendê bibîne, bêguman wê êrişeke dagîrkeriyê ya berfireh bide destpêkirin. Ji ber wê divê em ji aliye siyasî û leşkerî ve amade bin. Niha em xurt in, ew jî qels in. Hem hevsengî û hêzên navneteweyî û herêmî li gel me ne. Ji ber wê dewleta Tirk hema wisa li gorî dilê xwe nikare dagîr bike."
Ebdê got yekîtiya gelên herêmê roj bi roj xurttir dibe û aliyên dixwazin vê têk bibin encamê bi dest naxin. Ebdê mînaka Dêrezorê da û diyar kir ku piştî kuştina şêxên eşîran gel li dora QSD'ê û Rêveberiya Xweser kom."
Têkildarê hevdîtinên PYNK û ENKS'ê jî Mezlûm Ebdû got QSD garantoriya hevdîtinan dike û hevdîtin erênî ne û bawer dike ku bi demê re wê yekîtiyeke mayînde pêk bê.
Hevpeyvîna ANHA ya bi fermandarê giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê re wiha ye:
Di ser dagîrkirina Serê Kaniyê û Girê Spî re salek derbas bû. Bûyerên di vê sala derbasbûyî de çêbûyîn, hûn çawa dinirxînin?
Ev sala ku di ser êrişên dagîrkeriyê yên dewleta Tirk re derbas bûye, nîşan da ku hincetên dagîrkirinê pêş in û armanca sereke dagîrkirina herêmê ye. Herwiha hat dîtin ku hewl dide polîtîkaya tirkkirinê li herêmê pêk bîne û komên girêdayî xwe çêdike. Ev êrişên dagirkeriyê bi destê bermahiyên çeteyên El-Nusra û DAIŞ'ê ku di lîsteya terorê de ne, pêk ahtin. Dagirkeriya xwe ya li ser van herêman ji bo dagirkirina herêmên din bi kar tîne. Gelek kes birin Lîbyayê da ku di şerê li wê derê de bidin şerkirin. Bi heman armancê birin Azerbêcanê jî. Kurt û kurmancî armancên veşartî yên dewleta Tirk ên li dijî herêmên me hebûn û di vê sala derbasbûyî de ew armancan wê jî derketin holê.
Berî êrişên dagîrkeriyê we bi hêzên navneteweyî re peymanek çêkiribû, çima rîayeta wan peymanan nehat kirin, çima DYA'yê wê demê tercîheke wisa kir?
Eger mirov vê rewşê wiha binirxîne wê çêtir be; wê demê ji bo astengkirina êrişan hinek hewldan hebûn. Me heman hewldan kirin. Ji bo ku gelê me nebe qurbana êrişeke dagîrkirinê hewldanên me yên navneteweyî hebûn. Heta ew hewldan wek tifaqê hatin meşandin. DYA jî di nav de hebû. Hinek pêşketin jî çêbûn. Ji bo ku şerek çênebe, çi ji destê me hat, me kir. Konsensusek jî derkete holê. Her çend têra xwe negihaştibe encamekê jî bi qismî kete meriyete. Me peywira xwe bi cih anî. Lê di dawiyê de dewleta Tirk li ber çavê tevahiya cîhanê di serî de dest bi gefan kir û piştre jî êriş kir.
DYA ku dewleta garantor bû û ji bo peymanên ewlehiyê bûbû navbeynkar, li gorî berpirsyariya xwe tev negeriya.
Di serî de hinek hewldanên DYA'yê çêbûn, bi dewleta Tirk re hinek lihevkirin çêkirin. Lê belê dewleta Tirk hemû sozên xwe dan aliyekî û êriş kir. Di vê rewşê de divê helwesteke xurt a DYA û dewletên Koalîsyonê li dijî êrişan hebûya. Qet nebe dibe li hewldanên xwe xwedî derketana, lê ev yek nekirin.
Di encamê de berjewendiyên xwe ji xwe re kirin palpişt û li hemberî êrişên dewleta Tirk nesekinîn. Berevajî wê, hêzên xwe ji herêmê kişandin.
Divê DYA li biryara xwe xwedî derketa. Divê pêşî li vê êrişê bigirtana. Divê biryareke cidî têkildarî vê mijarê hebûya. Her wekî mi got; berjewendiyên xwe yên sîstematîk derxistin pêş û pêşî li êrişên dewleta Tirk negirtin. Di wê pêvajoyê de me jî daxuyanî dan û diyar kir ku ew biryar şaş in. Me li ser vê xakê li dijî terorê bi hev re têkoşîn dimeşand. Me got ev biryar derbeyeke giran li têkoşîna li dijî terorê dide. Ev sala ku di ser dagirkeriyê re




derbas bûye jî nîşan dide bê ka em çi qas mafdar bûn.
Piştî dagîrkirina hêrêmên bakur û rojhilatê Sûriyê gelek danûstandin û lihevkirin çêbûn. Lê dîsa jî êrişên dewleta Tirk nesekinîn û di van rojên dawîn de jî zêde bûne. Divê mirov çawa li van êrişan binêre?
Em vê rewşê her tim ji hêzên navneteweyî re jî vedibêjin. Di navbara Tirkiye û dewletên garantor de peyman çêbûn. Jixwe em di van peymanan de tune bûn. Di navbera DYA û Tirkiyê de li Stenbolê di 17'ê Cotmehê de, di 23'yê Cotmehê de jî li Soçîyê bi Rûsyayê re peyman îmze kirin. Li gorî wan peyamana divê her du alî jî li gorî peyamanan tev bigeriyana. Li gorî peymanan divê bi demografiya herêmê nehata lîstin. Divê xwe têkilî gelê herêmê nekin. Divê hebûna gelê herêmê nekeve xetereyê. Divê li hemberî sûcên xwe, bi xwe bisekine. Lê mixabin sûcên çeteyên dewleta Tirk ên li herêmê mubah dibînin. Dewleta Tirk li gorî peymanan divê bi xwe li dijî van sûcan derkeve lê pêşî li van sûcan vedike û teşwîq dike. Heta orgnîzasyona wan sûcan dike. Heke dewleta Tirk bi xwe organîzasyona wan sûcan nekira, ew çeteyên girêdayî wê, nedikarî tiştekî bikin. Ji ber vê yekê di her firsendekê de em tînin ser ziman ku dewleta Tirk li gorî peymanên ku îmze kirine, tev nagere.
Di demên dawîn de ne bi têne li herêmên ku dagir kirine, li ser xeta sînor jî li dijî herêmên me êrişan pêk tînin. Sivîlan digirin, îşkenceyê lê dikin û dikujin.
Helbet ev encameke siyaseta giştî ye û pirsgirêkeke cidî ye. Li hemberî vê yekê divê dewletên garantor bibin xwedî helwest û êrişan bisekinînin.
Yanî helwesta wan dewletên navborî dihêle ku dewleta Tirk êrişên dagîrkeriyê pêk bîne?
Ev rastiyek e; DYA û Rûsyayê berpirsyariyên peymanên li Stenbol û Soçiyê pêk neanîn. Em vê yekê her tim tînin ser ziman û rexne jî dikin. Dewleta Tirk bi domdarî hem li ser sozên xwe nasekine hem jî li gorî peymanan tev nagere. Helwesta her du dewletan a li dijî dewleta Tirk jî bi tene di asta pêşniyaran de dimîne. Lê belê divê ew dewlet helwesteke xurt nîşan bidin û divê vê yekê di pratîkê de jî nîşan bidin. Ji ber ku dewleta Tirk sivîl û siyasetmedarên herêmê dike hedef. Saziyên navneteweyî jî ev yek tespît û belge kir. Ji ber ku li dijî dewleta Tirk helwesteke xurt pêk nayê, dewleta Tirk û çeteyên wê bi domdarî êriş dikin. Bo nimûne, ji ber ku helwesteke xurt tune bû, di pêvajoya karantînaya vîrusa koronayê de dewleta Tirk û çeteyên wê bi ser Hesekê de ku milyonek şêniyên wê hene, av birî. Lê dîsa jî helwesta li dijî dewleta Tirk bi tenê di asta pêşniyaran de dimîne. Lê divê helwesteke hişk hebe û divê çavên dewleta Tirk bitirsîne da ku careke din van sûcan pêk neyne.

## 'DEWLETA TIRK DESTKEFTIYÊN KURDAN DIKE HEDEF'

Ihtîmal heye ku êrişeke nû ya dagîrkeriyê çêbe? Di rewşeke wisa de li herêmê hevsengiyên çawa wê çêbin?
Niha du rewş hene, divê em wan ji hev cuda bikin. Her tim armanceke dewleta Tirk heye ku êrişeke mezintir bike. Ne wekî ku propaganadaye wê tê kirin; ji ber ku li vir hin dijminên dewleta Tirk hene, êriş nake. Ev dereweke mezin e. Derdê esas ê dewleta Tirk gelê Kurd e. Bi tu awayî naxwazin Kurd li vir bibin xwedî statu. Dewleta Tirk tehemulî mafekî herî biçûk ê gelê Kurd jî nake. Dewleta Tirk her tim dibêje "Me xetayeke mezin kir ku me hişt Kurd dli Başûrê Kurdistanê bibin xwedî statu, em ê vê xetayê li wê derê dubare nekin." Hêj di sala 2011'an de ev yek digotin. Bi awayekî aşkera ev gotin. Îro jî di çarçoveya vê siyaeteê de hewldanên xwe dikin. Lewma jî heke ji dest bê dê hema sibê êriş bike. Bi tu awayî dewleta Tirk dev ji armanca xwe ya dagirkirina vê herêmê bernedaye. Dema ku ev der dagir kir, bi tenê pêşî li statuya Kurdan nagire, her wiha ji bo siyaseta xwe ya derve jî bi kar tîne û dê bi kar bîne jî. Çeteyên ku dişîne Lîbya û Azerbêcanê, ji vê derê dişîne. Dagir dike, mirovan bi rêxistin dike û ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne. Lewma jî divê haya me ji yekê hebe û em her tim bergiriyên xwe bigirin.
Lê divê ev jî bê zanîn; dewleta Tirk ne xwedî wê hêzê ye ku çi tişta bixwaze, dikare bike. Dibe ku wisa nîşan bidin lê rastî ne wisa ye. Pirsgirêkên wê yên pir giran hene. Di hundir de pirsgirêkên wê yên mezin hene. Heke îro êriş pêk tên jî, ne ji ber xurtbûna wê ye, berevajî wê, ji ber qelsiya wê ye. Dewleta Tirk li vê herêmê hema wisa her tişta ku dixwaze, nikare bike. Hem hevsengiyên herêmî vê yekê nahêlin, hem jî amadehiyên me yên dîplomatîk, siyasî, leşkerî destûrê nadin vê yekê. Heke bê pirsîn ku dewleta Tirk dê dîsa êriş bike yan na; belê, çi dema dewleta Tirk firsend dît, dê êriş bike lê ew qas jî hêsan nabe.



## Li rêber Ocalan 6 mehan hevdîtina bi parêzeran re hat qedexekirin

*Li rêber Abdullah Ocalan* û 3 girtiyên li gel, ji bo 6 mehan hevdîtina bi parêzeran re hat qedexekirin. *R-2*





## Li bakur û rojhilatê Sûriyê 79 kesên din bi koronayê ketin

*Desteya Tenduristiyê* ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ragihand ku 79 kesên din bi koronayê ketine. *R-2*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 801 07-Cotmeh- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## 34 milyon û 831 hezar kes bi vîrûsê ketin



Li gorî daneyên malpera "worldometers" li seranserê cîhanê milyonek, 33 hezar û 238 kesî jiyana xwe ji dest daye û 34 milyon, 831 hezar û 366 kes jî bi vîrûsê ketine. *R-2*

# "Nûçeya 'Gerîla li Ermenistanê şer dikin' derew e"

Dewleta Tirk ya dagîrker li milekî çeteyên sûrî kom bi kom dişîne Azerbeycanê, li milekî di ragihandina xwe de derewa "PKK li Qerebaxê şer dike" belav dike. Berdevkê Komîteya Têkiliyên Karê Derve ya KCK'ê Ronî Serdem diyar kir ku agahiyên ji aliyê dewleta Tirk ve tên belavkirin ku hêzên gerîla li Ermenistanê şer dikin derew in. *R-4*




## Yekîtiya Jinên Suryan kongreya xwe ya 3. li dar xist



*Yekîtiya* Jinên Suryan ya Sûriyê bi durişma "Têkoşîna jinê, edalet, aştî û azadî ye" kongreya xwe ya sisiyan li dar xist. *R-3*

## Sala perwerdeyê bi coş û kelecana fêrkirina zimanê kurdî dest pê kir



*Xwendekarên* asta amadeyî diyar kirin ku ji ber ku ji wan re derfeta xwendina bi zimanê kurdî hatiye dayîn, gelek kêfxweş û bikelecan in. Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo serkeftina perwerdeyê, ev gava nû ji bo guhertina materyalan avêt. *R-6*


## Festîvala Çandê ya Şehîd Genco bi dawî bû



*Festîvala* Çandî ya 3. ya Şehîd Genco ku bi durişma 'Bes e ji tecrîd, faşîzim û dagîrkeriyê re; dem dema azadiyê ye' li Seyrangeha Dukan ya Başûrê Kurdistanê dest pê kirî bi dawî bû. *R-7*

# Li rêber Ocalan 6 mehan hevdîtina bi parêzeran re hat qedexekirin


Li rêber Abdullah Ocalan û 3 girtiyên li gel, ji bo 6 mehan hevdîtina bi parêzeran re hat qedexekirin.



Li rêber Abdullah Ocalan, Omer Hayrî Konar, Veysî Aktaş û Hamîlî Yildirim hevdîtina parêzeran hat qedexekirin.
Li ser daxwaziya Serdozgeriya Komara Tirkî ya Bûrsa, Dadgeha 2. ya Bûrsayê li Ocalan û 3 kesên li Îmralî ji bo 6 mehan hevdîtina parêzeran qedexe kir. Li gorî agahiyan biryar 23'yê Îlonê hatiye dayîn.
Parêzer herî dawî 22'yê Gulanê, 12-18'ê Hezîranê û 7'ê Tebaxa 2019'an çûbûn Îmralî. Ji wê demê ve 107 caran serlêdan hatine kirin, lê bêbersiv hatine hiştin.

## 34 milyon û 831 hezar kes bi vîrûsê ketin

Li gorî daneyên malpera "worldometers" li seranserê cîhanê milyonek, 33 hezar û 238 kesî jiyana xwe ji dest daye û 34 milyon, 831 hezar û 366 kes jî bi vîrûsê ketine.



Li seranserê cîhanê 34 milyon, 831 hezar û 366 kes bi virûsa koronayê (Covid-19) ketin û milyonek, 33 hezar û 238 kesî jî jiyana xwe ji dest daye. Li gorî malpera "worldometers" her roja derbas dibe jimar pirtir dibe. Çend dewlet daneyên rast par ve nekin û rastiya heyî veşêrin jî vîrûs ji ber bêtedbiriyê belav dibe. Li gorî "worldometers" herî zêde Emerîka, Hindîstan, Brezîlya, Rûsya û Kolombiya ji vîrûsê bibandor bûne.

Li Emerîka 7 milyon, 549 hezar û 323 kes bi vîrûsê ketine û 213 hezar û 524 kesî jî jiyana xwe ji dest daye. Li Hindistanê 6 milyon, 473 hezar û 544 kes bi vîrûsê ketine û 100 hezar û 875 kesî jî jiyana xwe ji dest daye. Li Brezîlya 4 milyon, 882 hezar û 231 kes bi vîrûsê ketine û 145 hezar û 431 kesî jî jiyana xwe ji dest daye. Li Rûsyayê milyonek 194 hezar û 643 kes bi vîrûsê ketin û 21 hezar û 77 kesî jî jiyana xwe ji dest dan. Li Kolombiyayê jî 841 hezar û 531 kes bi vîrûsê ketin û 26 hezar û 397 kesî jî jiyana xwe ji dest daye.

## Li bakur û rojhilatê Sûriyê 79 kesên din bi koronayê ketin

Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ragihand ku 79 kesên din bi koronayê ketine.




Hevserokê Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilata Sûriyê Ciwan Mustefa diyar kir ku kesên bi koronayê ketîn 43 mêr, 36 jin in û li van herêman in:
Hesekê:11
Qamişlo:3
Dêrîk:10
Girkê Legê:7
Amûdê:1
Tirbespiyê:1
Reqa:22
Kobanê:11
Tebqa:9
Minbic:4
Mustefa diyar kir ku 10 kesên bi koronayê ketîn baş bûne.
Heta niha li bakur û rojhilatê Sûriyê hezar û 918 kes bi koronayê ketine, ji wan 69 kes mirine û 496 baş bûne.

## Cenazeyê şehîdê Erkê Xweparastinê Sitêf hat veşartin



Bi sedan şêniyên bajarê Qamişlo cenazeyê şehîdê Hêzên Erkê Xweparastinê Enes Sitêf li goristana Şehîd Delîl Saroxan spartin axê.

Bi sedan şêniyên bajarê Qamişlo û navçeyên wê cenazeyê şervanê Hêzên Erkê Xweparastinê Enes Sitêf ku 2'yê Cotmehê li ser erkê xwe şehîd bûbû, bi merasîmekê li goristana Şehîd Delîl Saroxan veşartin.
Di merasimê de li ser navê Meclisa Malbatên Şehîdan a Qamişlo Emar Mûsa sersaxî ji malbata şehîd re xwest û got, xwîna Kurd, Ereb û Sûriyan di ber vê xakê re tev li hev bû û biratiya gelan, jiyana hevbeş ava kirin.
Pişt re nasnameya şehîd hat xwendin û radestî malbatê hat kirin.
Hevalên çekê yên şehîd cenazeyê hevalê xwe di nava tîlîliyên dayîkan û durişman de spartin axê.

## Meha Îlonê li Efrînê 2 sîvîl hatin kuştin, 84 sîvîl hatin revandin

Rêxistina Mafên Mirovan ya Efrîn-Sûriyê sûcên artêşa Tirk û çeteyên wê yên meha Îlona derbasbûyî li kantona Efrînê kirîn, belge kirin û diyar kir ku 2 sîvîl hatine kuştin, 84 kesên din jî hatin revandin.

Têkildarî sûcên artêşa Tirk û çeteyên wê yên li dijî welatî û xwezaya Efrînê ya dagîrkirî yên meha Îlonê, Rêxistina Mafên Mirovan ya Efrîn-Sûriyê daxuyaniyek da.
Daxuyanî li Kampa Serdem a li kantona Şehbayê bi zimanê kurdî ji hêla endama rêxistinê Wefaa Bekir ve û bi zimanê erebî jî ji hêla endama rêxistinê Heyhan Elî ve hate xwendin.
Daxuyanî wiha ye:
"Meheke biêş û sûcdariyan li arşîva dagîrkeriyê û komên pê ve girêdayî yên ji Sûriyê zêde dibe. Li bajarê Efrînê sûcên li dijî sîvîlên Kurd dewam dikin. Di meha Îlona 2020`an de sûcê kuştin, revandin û işkenceyê, bi zora çekan zewicandina keçên malbatên Kurd bi endamên komên çeteyan re, hatin belgekirin.
Li deverên bajêr darên zeytûnan û yên daristanî hatin qutkirin, agir bi daristanan xistin û ji ber wê gelek rûber hatin şewitandin. Di heman demê de hêzên artêşa Tirk ji bo dîrok û şaristaniya Kurd a vî bajarî tune bike, şûnwarên talan dike û bi darê zorê sivîlan ji malên wan derdixe.
Meha Îlon Sîvîlek û zarokek bi guleyan hatin kuştinin. 84 welatî jî hatin revandin û bermaberî bardana 14 kesan ji wan, fîdye hat dayîn, di nav de 8 jin û zarok in.



## Ciwanên şoreşger yên Kobanê li dijî dagîrkeriyê meşiyan

Tevgera Ciwanên Şoreşger ya Sûriyê di çarçoveya pêngava "Na ji dagîrkeriya Tirk re, ji parastina destkeftiyên şoreşê re erê" de meşeke bi meşeleyan li dar xist.

Berî destpêkirina meşê, koma Şehîd Star şanoyeke li ser tundiya li ser jinan û xwekuştina jinan peşkeş kir.
Meşa ku bi sedan ciwan tevlê bûbûn, ji pêşiya Navenda Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê ya Kobanê ber bi qada Jina Azad ve dest pê kir.
Ciwanan alên Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê, posterên Rêber Abdullah Ocalan û pankartên bi nivîsên "Em ê teqez bi ser bikevin" hildan û durişmên li dijî dagîrkeriyê avêtin.
Li qada Jina Azad çalakiyeke hate lidarxistin û bi deqeya rêzgirtin dest pê kir. Ji rêveberên Tevgera Ciwanên Şoreşger a Herêma Firatê Mihemed Mehmûd Hisên bang li ciwanan kir ku beşdarî pêngava "Na ji dagirekriyê re, ji parastina destkeftiyên şoreşê re erê" bibin.
Çalakî bi gerandina xelekên dîlanê bi dawî bû.





# Festîvala Çandê ya Şehîd Genco bi dawî bû

Festîvala Çandê ya 3. ya Şehîd Genco ku bi durişma 'Bes e ji tecrîd, faşîzim û dagîrkeriyê re; dem dema azadiyê ye' li Seyrangeha Dukan ya Başûrê Kurdistanê dest pê kirî bi dawî bû.

Festîvala Çandê ya 3. ya Şehîd Genco Hesekê ku ji aliyê Tevgera Jinên Ciwan yên Têkoşer (TJCT) û Ciwanên Welatparêz (TCW) ve li Seyrangeha Dukan ya Silêmanî ya başûrê Kurdistanê hatibû destpêkirin bi dawî bû.
Di serî de ciwan gelek kesên ji deverên cuda yên başûrê Kurdistanê tevlî festîvalê bûn. Di festîvalê de peyamên Komîteya Piştgiriya Malatên Şehîdan ya PKK'ê ya Başûr, Jinên Ciwan ên Têkoşer, Ciwanên Welatparêz û malbata şehîd hatin dayîn.
Di dewama bernameya festîvalê de Koma Kevana Zêrîn derket ser dikê û hunera xwe pêşkêş kir. Pişt re jî Koma Govendê ya Kurdistan ku ji Şarezûr tevlî festîvalê bûbû, derket ser dikê û govend gerand.
Herwiha Koma Şehîd Serhed, Hunermend Necim Mehemed hunera xwe pêşkêş kirin. Dîsa koma Hunere Ciwanekan, koma govendê ya Şehîd Viyan Soran, Koma muzîkê ya Mexmûr û koma sikecê ya Nexemey Deşt jî di dewama bernameyê de hunera xwe nîşan dan.
Festîval bi gerandina govendê û qirkirina dirûşman bi dawî bû.



## Li Şehbayê şevbêrka "Çanda Efrînê zindî ye"



Tevgera Çand û Hunerê bi dirûşmeya "Çanda Efrînê zindî ye", şevbêrkeke çandî li ser çand û kevneşopiya Efrînê li kampa Serdemê ya kantona Şehbayê li dar xist.

Bi sedan şêniyên Efrînê, tevlî komên çand û hunerê yên kampa Berxwedan di şevbêrkê de amade bûn. Cihê şevbêrkê bi amûrên kevin yên weke meşk, destar û gelek alavên din hatibû xemilandin. Piştî rêzgirtinê, endamê Tevgera Çand û Hunerê ya kampa Berxwedan Azar Şêrhat, armanca lidarxistina şebêrkê diyar kir û got, "Dewleta Tirkî ya dagîrker hewl dide nasnameya Efrînê ji holê rake. Bi van çalakî û parastina çand û kevneşopiya xwe emê hewldanên wê pûç bikin."
Pişt re hunermend Mihemed Welîd, komên çand û hunerê stiranên gelêrî gotin.
Herwiha li ser girêdana şêniyên Efrînê bi xaka wan ve şanoyek hat nîşandan.
Şevbêrk bi gerandina xelekên dîlanê li ber stiranên gelêrî bi dawî bû.

## Qonaxa 3. ya pêşbirka "Nivîskarên paşrojê" dest pê kir

Qonaxa 3. ya pêşbirka zarokan ya "Nivîskarên Paşrojê" dest pê kir. Komîteya amadekar ya pêşbirkê diyar kir ku wê di demeke nêzîk de navê kesên serkeftî werin eşkerekirin.

Ji bo teşwîqkirina zarokan li ser xwendin û nivîsndinê ku di paşrojê de bibin nivîskar, Desteya Çand û Hunerê meha Tebaxê û cara yeke li ser asta herêmê bi navê "Nivîskarên Paşrrojê" pêşbirkek dabû destpêkirin. Zarokên 10 salî heta 17 salî beşdarî pêşbirkê bûn ku li gorî 2 beşan hatibû dabeşkirin. Zarokên ku beşdarî pêşbirkê bibin bi zimanê dixwazin (erebî, kurdî) berhemên xwe, kurteçîrok, nivîs û helbestan pêşkêş kirin.
Qonaxa yekê û duduyan ya pêşbirkê li parka Xwendinê ya bajarê Qamişlo bi dawî bûn.
Roja Înê qonaxa sisiyan ya pêşbirkê bi beşdariya 90 zarokan dest pê kir. Her beşdarî berhemên xwe li pêşiya komîteyê xwendin. Ji kesên beşdarî pêşbirkê



bûyîn wê 12 werin hilbijartin û navên kesên serkeftî wê di demeke nêzîk de werin ragihandin.

## Çend bîranîn ji Kurdistanê



Derwêş M. FERHO

Sal 2010 e. Di dawiya meha Temûzê de tevî cîgirê serokê Parlementoya Brukselê Jan Béghin, rojnamevan Rişto Tunç, Dr. Ihsan Nebîzade, rojnamevan-nîvîskar Heso Hurmî û rojnamevan Els Vandermeersch em li Başûrê Kurdistanê ne.
Armanca me serlêdana Başûr e: Dihok, hêrêma Êzdiyan Şêxan, Laleş, Baedrê, gundên Xanikê û Şahriya ye. Li cî em li rewşê binêrin, bibînin, agahdar bibin û vegerin.
Li Dihokê em wek şande ji bo konferansa Yekîtiya Nivîskarên Başûrê Kurdistan hatin vexwendin. Mamoste Hesen Silêvanî serkêşiya vê civînê dikir. Jan Béghin di axaftina xwe de hevkariya xwe wek parlementerekî dostê Kurdan pêşkêş kir.
Ez jî vexwendin ser mîkrofonê.
Ji sedema ku wezîrê kultûrê yê Başûrê Kurdistan rûniştibû min di axaftina xwe de, paş hêviya serketina saziya nivîskaran, ji rayedarên Başurê Kurdistan daxwaza alîkariya rojnameya Rêya Teze li Êrîvanê kir. Ji sedema ku ew rojnameya dîrokî di xetera man û nemanê de bû. Alîkarî hat kirin yan na ne agahdar im.
Roja din de em li Şêxanê çûn serlêdan Mîr Tahsîn Beg û pey re jî çûn ba Baba Şêx. Mîr di 28ê çilêyê 2019 de û Baba Şêx jî di 1ê cotmehe 2020 de diçin ser dilovaniya xwe. Salek paş koça Mîr Tahsîn Beg, bi koça dawiyê ya Baba Şêx, serokê civata rûhî ya Êzdiyan û Extiyarê Mergehê pir xemgîn bûm. Ciyê her duyan jî buhuşte. Bi hundakirina van her du şexsiyetên giranbiha civaka Êzdî, gelê Kurdistan du sembolên xwe yên mezin hunda kir. Gerek e Kurdistanî van her du kesan ji bîr nekin.
Bê goman bi wê fersendê re roja din me berê xwe da çiyê û yek ji pismamê xwe cara yekê min didît. Dema ez ji welêt derketibûm ew hê nebû. Apê min behsa wî dikir. Û li çiyê em temamiya rojê bi wî re, bi hevalên din re man, me sohbet kir û roj buhurand. Heweha em bi voleybol jî lîstin. Ekîba Ewropî di hember ya çiyê de. Çi bêjim, ew ji me xurttir bûn.
Di vergera xwe de her endamekî ji vê şandeyê çi ji dest hat pêk anî.
Bi alîkariya cîgirê serokê parlementoya Brukselê Jan Béghin me Konferansek li ser pirsgirêka Kerkûkê, maddeya 140 ya Qanûna Iraqê di nava avahiya Parlemento de amade kir. Di wê konfeansê de Dr. Kemal Kerkukî jî amade bûbû. Û cara yekem bû ku ne Kurd li sikakan derdiketin û meşên protesto pêk dianîn. Turk bi birayên xwe Turkmenan re di hember vê konferansê de meşek li ber deriyê parlemento dikirin.
Rojnamevan Rişto, Els û Heso jî bi nivîs û wêneyên xwe ev gerra di çendîn rojnameyan de nivîsandin. Dr. Ihsan jî çendîn car bûye sebebê gelek alîkariyên cîhazên saxiyê ji bo Kurdistanê.
Bi vê nivîsa xwe, dîsa sersaxiyê ji malbata Baba Şêx, sebrê ji civaka Êzdî û temamiya Kurdistaniyan re hêvî dikim. Ciyê wî buhşt e.

# Sala perwerdeyê bi coş û kelecana fêrkirina zimanê kurdî dest pê kir

Xwendekarên asta amadeyî diyar kirin ku ji ber ku ji wan re derfeta xwendina bi zimanê kurdî hatiye dayîn, gelek kêfxweş û bikelecan in. Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo serkeftina perwerdeyê, ev gava nû ji bo guhertina materyalan avêt.

Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo serkeftina perwerdeyê, perwerde bi giştî û astên wê tev wê bi hev ve girêdayî bin. Materyalên amadeyî bi her du beşên wê yên wêjeyî û zanistî bi zimanê kurdî û erebî derbasî nava materyalên Rêveberiya Xweser bûn.
Desteya Perwerde û Fêrkirinê di çarçoveya plansaziya ku ji salekê ve daniye de, ev gav avêt. Bi armanca ku xwendekar dema bigihin asta zanîngeh û paymengehê ji tevayiya aliyan ve amade bin û ti astengî li pêşiya wan dernekevin.
Dibistan li herêmên Rêveberiya Xweser 27`ê Îlonê hatin vekirin. Jimara dibistanên ku materyalên Rêveberiya Xweser tê de têne dayîn li herêma Cizîrê 2 hezar û 225 dibistanên her sê astan (seretayî, navî û amadeyî) û jê 71 dibistanên amadeyî ne.

**MAMOSTE BERÎ DESTPÊKIRINA SALA XWENDINÊ YA NÛ PERWERDE BÛN**

Cîgira hevserokatiya Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê Zehre Elî diyar kir ku tevayiya mamosteyên dibistanên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji zanîngeh û paymengehên Rêveberiya Xweser derketine. Di nava akademiyên taybet de di perwerdeyên girtî re girêdayî rêbazên wanedayînê yên materyalên bi zimanên Kudî û Erebî derbas bûn. Perwerde mehekê dewam kir.
Ji bo perwerdekirina mamsoteyan li herêma Cizîrê du akademî hene, Akademiya beşa zimanê Erebî ya taybet bi materyala erebî li kantona Hesekê ye. ya din Akademiya Şehîd Egîd Çîlo ya materyala bi zimanê Kurdî li bajarê Qamişloyê ye.



**BIRYARÊN RÊGIRTINA LI PÊŞIYA BELAVBÛNA VÎRÛSA KORONAYÊ DI DIBISTANAN DE**

Derbarê tedbîrên xweparastina ji vîrusa Koronayê, Rêveberiya Xweser bi koordîneya bi Desteya Tenduristî û Şaredariyan re gelek tedbîrên xweparastinê girtine, jê dezefektekirin, neçarkirina xwendekaran ku maskan di dewamê de bi kar bînin û civîn bi malbaran re girêdayî pêwîstiya pêkanîna tedbîrên xweparastinê li dar xistine.
Li gorî biryara Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê, xwendekarên asta amadehî neçar in ku rojane biçin dibistanê.

## Perwerde bingehê jiyanê ye

**Darîn SILÊ/Ronahî-Qamişlo**

Ji ber rewşa giran ya bi salan ya ji ber şerê navxweyî yê li Sûriyê li herêma me derbeke mezin li perwerdeyê ket. Digel van zehmetiyan bi hewldana Rêveberiya Xweser sala 2014an girêdayî Desteya Perwerdeyê bi zimanê kurdî, erebî û suryanî Saziya Minhacan hat avakirin. Tevî ku minhac ji hêla hinekan ve nehat qebûlkirin perwerdeyê dest pê kir û pêş ve çû.



**MINHACA REFA 12AN JÎ HATIYE AMEDEKIRIN**

Hevserokê Saziya Minhacan ya bajarê Amûdê Mekseb Seyah, li ser zarokan, girîngiya perwerdeyê û xebata xwe ji rojnameya me re wiha axivî: “Zarok nifşên paşrojê, şaxên jiyanê û stûna avakirina civakeke bihêz, saxlem û pêşketî ne. Perwerde jî bingehê jiyanê ye û xwedîgirîngiyeke mezin e. Herwiha dayîna hişmendiyeke rast û guhertina civakê ye. Destpêka sala 2014an Saziya Minhacan li bajarê Rimêlanê hat avakirin. 1ê Gulana 2018an sazî hat Amûdê. Ji wê demê ve em li vir kar û xebata xwe bi rê ve dibin. Minhaca me ji sê qonaxan pêk tê; qonaxa seretayî, navî û amadeyî. Despêkê me li ser qonaxa seretayî kar kir û minhac hat derxistin. Piştî wê ya navî û ya amadeyî. Ji dawiya 2019an ve em li ser minhaca refa 12. kar dikin. Niha hatiye bidawîkirin û nêzî 10.000 pirtûkî hatine çapkirin. Minhac li gorî fikrê civakê bi zimanê kurdî, erebî û suryanî ji beşa zanistî û wêjeyî, hat amedekirin.” Mekseb Seyah axaftina xwe wiha qedand: “Me gelek zehmetî kişand, çimkî amedekirina minhacekê nû ne tişteke hêsan bû. Ji ber êrişên dewleta Tirk ya dagîrker piraniya xwendekarên me ji xwendina xwe qut bûn. Vê rewşê bandoreke mezin li xwendekaran kir. Ji bo wê em hewl didin minhac li gorî rehetiya xwendekaran be. Herwiha xwesteka me ew e ku em bikarin ji zarokên xwe re paşrojeke baş ava bikin. Karê me dest pê kirî emê bi biryardarî bidomînin û bigihînin encamê. Çimkî em xwedîvîneke mezin in.”

## Pirsgirêka kûçikan

**Hediya Hisên/Ronahî-Qamişlo**

Li rojavayê Kurdistanê pirbûna kûçikan di nava civakê de dibe sedema metirsiyeke mezin. Gel li bendê ye ku şaredarî çareseriyekê peyda bike.

Derbarê mijarê de mamoste Esmehan Qirşê ji rojnameya me re ev nerxandin kir: “Dewleta Tirk ya dagîrker bi zanebûn kûçikên har di ser sînor re dişîne herêmên me. Pirbûna kûçikan ji me re bûye pirsgirêk. Êrişî zarok û mezinan dikin. Li bajarê Qamişlo berî demekê kûçikekî du zarok gez kiribûn û birîndar kiribûn. Dema xwendekar li kolanan kûçikan dibînin ji tirsa nayên dibistanê, vedigerin malên xwe. Bi taybetî danê êvaran em bi tirs ji malên xwe derdikevin. Bi şev jî ji ber dengê wan em nikarin razin. Bandoreke neyînî li bajêr dikin. Ziyanê didin gel û mirov bi rehetî tev nagerin.”
Esmehan Qirşê axaftina xwe wiha qedand: “Berî niha şaredariyê kûçik dikuştin. Ji bo ku pirsgirêk mezintir nebe û zarokên me bêtirs bên dibistanê, daxwaziyê min ji şaredariyê ew e ku erkê xwe pêk bîne û berî gavekê ji vê pirsgirêkê re çareseriyekê bibîne.
Li ser heman mijarê welatiyê bi navê Ebdilhelîm Bêzê yê ji taxa Hilêliyê ya Qamişlo jî wiha axivî: “Pirbûna kûçikan pirsgirêk e. Sibehan dema diçim firûnê bitirs diçim. Gelaşa li ber deriyên malan belav dikin û kolanan gemar dikin. Lê ne ev tenê êrişî mirovan jî dikin û dibin sedema gelek nexweşiyan jî. Bi hêvî me şaredarî çareseriyekê peyda bike û gelaş li dûrî bajêr bê avêtin.”
Li ser mijarê me xwest nêrîna şaredariya bajarê Qamişlo bigirin lê bersiva me nedan.







COTMEH

Ahmet Aktaş

Hinek bûyerên vê mehê yên sereke û girîng:
- 9.10.1998 Roja despêka pêvajoya komploya navdewletî ya li dijî Rêber Ocalan
- 6-7-8.10.2014 Rojên êrîşên li ser KOBANÊ yên giran û dijwar ên ji aliyê DAIŞ û Dewleta R.T.Erdogan ve
- 7.10.2014 Roja R.T.Erdogan, li Çadirkent-Islahiye-Dilok’ê, got ”Kobanê ket dikeve”!
- 10.10.2015 Roja komkujiya li Gara Enqereyê(109 mirov hatin qirkirin)
- 9 COTMEH 2014 Roja çalakiya canbexşane û efsanewî ya 15 lehengên jin (YPJ), di pêşengtiya Arîn MÎRKAN de-Girê Miştenurê!

Weke tê xuyakirin bûyera me ya yekemîn, despêka pêvajoya komploya navneteweyî ya li himberî Rêberê gelê Kurd Ocalan e. Armanca hêzên hêgemon ên cîhanî; bi rakirina vî kelemî, ew ê dizayna xwe ya sedsala 21’ê despêkirina.
Lê li goreyî dilê wan pêknehat. Bi tenê dîlgirtin pêkhat. Belê daxwaza dilê wan; bi dilgirtina Rêber APO re, wî teslîm bigrin û bixin xismeta vê projeya xwe ya cîhanî. Her wiha bi dîlgirtina Rêberiyê ve, Tevgêra wî jî têkbibin û wê jî bixin xizmeta xwe.
Na xêr, ev armanca wan pêknehat. Ne Rêber APO teslim bû, ne jî Tevgêra Rizgariya Azadiya Kurdistanê têkçû. Berovajî, her du jî xurtir bûn. Bê gûman derbeyên mezin hatin xwarin, êş û êşkence, kuştin û girtin, talan wêran, hejarî û penaberî gelek çêbûn û hîn jî dom dike. Lê nagihên armancên xwe. Ji ber ku reh û bingehê vê Tevgêrê, baş û xurt hatine danîn.
Hilbet, qelenê vê neşkandinê, serkeftin û destkeftinê, ne kêm bûn. Hema di despêkê de em bêjin, 21 sal e ku Rêberê me li Imraliyê di bin tecrîd û tehdîdên giran de dijî.
Hern wiha me, li jor hinek bûyerên giran û xemgîn, belê ewqas jî xwedî rûmet û serbilindî rêzkirine.
Yek ji destkeftiya sereke ya wê fikir û raman û berxwedana Rêber APO û têkoşerên leheng ên canbexş ev bû ku pêkhatina Şoreşa ROJAVA ye. Hêzên hegemon û dagirker, bi taybetî jî qirkerê sereke R.Erdogan, li himber vê bûyera dîrokî gelek hêrs bûn û hema bi lez, plan û projeyên xwe yên qirêj çêkirin û dest bi êrîşên hovane kirin. Fermandariya navendî ya dagirkerî û qirkeriyê dan destê R.T.Erdogan. Erê bi navê DAIŞ’ê êrîşên giran û bêexlaqî meşandin, lê bi pir navên din jî êrîşkarî berfirehtir kirin. DAIŞ’ê, derbên mezin xwarin û rûyê wî yê reş deşifre bû, lewma nuha, aşkere bi hêza dewleta tirka û bi hinek navên din ên dînî û xiyaneta kurdan, hemu di bin fermandariya R.T.Erdogan kom kirine. Di şikandina DAIŞ’ê û aşkerekirina rûreşiya R.T.Erdogan de, bi taybetî rola qehremaniya Arîn Mirkan û hevalên xwe yên YPJ-YPG’ê ya li Girê Miştenûrê-KOBANÊ, sereke bûn.

Li pey vê serkeftinê 1’ê Mijdarê weke Roja Cîhanî ya Kobanê hat ragihandin. Nuha jî, 10’ê COTMEHÊ, ROJA CÎHANÎ YA AZADIYA RÊBER ABDULLAH OCALAN tê ragihandin.
Divê ji bo misogerkirina vê Rojê û li goreyî ruhê wan li ser şopa şehîdên xwe yên leheng, em tevbigerin!



# Endamên Kongreya Star: Pêngava “Ji dagîrkeriya Tirk re na” berdewama şoreşa azadiyê ye

Endamên rêveberiya Kongreya Star ya herêma Firatê diyar kirin ku pêngava “Ji dagîrkeriya Tirk re na, dem dema parastina şoreşê ye” ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) dayî destpêkirin, berdewama şoreşa azadiyê ya ji 9 salan ve dest pê kirî ye. Divê jin cihê xwe di vê pêngavê de bigirin.



Endamên rêveberiya Kongreya Star ya herêma Firatê têkildarî pêngava PYD`yê ya bi durişma “Êdî bes e ji dagîrkeriyê re, dem dema parastina şoreşê ye”, axivîn û nêrînên xwe par ve kirin.
Berdevka Kongreya Star ya herêma Firatê Mizgîn Xelîl wiha got: “Pêngava PYD`ê berî demekê ragihandî, berdewama şoreşa xilasiya ji zulm û koletiyê ye, ku ji 9 salan ve li Sûriyê bi giştî û li bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî dest pê kiriye.”
Mizgîn wiha domand: “Serkeftina şoreşê li bakurê Sûriyê û serkeftina projeya biratiya gelan, li dijî dewleta Tirkî nerihet kir. Ji ber wê bi tevayiya rêbazan hewl da têk bibe.”
Mizgîn bang li gelên bakurê Sûriyê kir ku tevlî pêngavê bibin û bi propagandaya dewleta Tirkî nexapin û got, “Divê jin li vê pêngavê xwedî derkevin. Lewre şoreşa Rojava bi şoreşa jinan tê naskirin. Ji ber wê divê mîrasa şehîdên jin ên canê xwe ji bo şoreşê feda kirîn, biparêzin.”
Endama rêveberiya Komîteya Perwerdeyê ya Kongreya Star a herêma Firatê Şevîn Qol Agasî got, “Dem demeke hesas e, divê em piştgiriya PYDê û pêngava wê bikin. Divê em bi riya saziyên xwe civakê zana bikin.”
Di dawiya axaftina xwe de Şevîn bang li gelê bakur û rojhilatê Sûriyê kir ku tevlî pêngavê û çalakiyan bibin da dengê xwe bigihîne cîhanê, rêxistinên hiqûqî û mirovî. Lewre dem hatiye ku em azadiya xwe bi dest bixin. Divê gelên herêmê têkoşîna xwe ya şoreşgerî bidomînin heta ku bigihin armanca xwe.”

## Yekîtiya Jinên Suryan kongreya xwe ya 3. li dar xist



Yekîtiya Jinên Suryan ya Sûriyê bi durişma “Têkoşîna jinê, edalet, aştî û azadî ye” kongreya xwe ya sisiyan li dar xist.

Yekîtiya Jinên Suryan ya Sûriyê bi durişma “Têkoşînê jinê, edalet, aştî û azadî ye” roja Înê kongreya xwe ya sisiyan li hola Zana ya bajarê Qamişlo li dar xist. Endamên yekîtiyê, nûnerên Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê û partiyên siyasî beşdarî kongreyê bûn.
Di kongreyê de axaftin hatin kirin, rapora rewşa rêxistinî ya yekitiyê û rêziknameya wê hatin xwendin û li ser nîqaş hatin kirin. Herwiha serok û meclisa yekitiyê hatin hilbijartin.
Endama rêveber a Meclisa Giştî ya Yekitiya Jinên Suryan a Sûriyê Sebah Şabo diyar kir ku kongrê di bin durişma “Têkoşîna jinê, edalet, aştî û azadî ye” hat lidarxistin û got, “Jin her tim banga aştî, edalet û azadiyê dike. Jin dikare civakeke demokratîk biafirîne ku hemû rengên newekheviyê rake. Her wiha qeydên ku adet û kevneşopî ew pêçandinbûn şikandin.”
Sebah diyar kir ku di kongreyê de rêziknameya yekitiyê, astengiyên ku yekitî tê re derbas bû, çawaniya aktîvkirina rola jinên Suryan di her qadan de, bi taybet di qada siyasî de û beşdarkirina wê di çareserkirina aloziyê Sûriyê de hatin nîqaşkirin.
Sebah Şabo bal kişand ser biryarên ku di kongreyê de hatin girtin û wiha domand: “Çend biryarên hatîn girtin ev in; sîstema hevserokatiyê di hemû saziyên Suryanî de were pêkanîn, ji bojinan kampên perwerdeyê werin vekirin, têkiliyên bi rêxistinên jinan ên ji hemû pêkhateyan werin pêşxistin. Her wiha biryar hate girtin ku rola jinên suryan di rêveberiyên xweser de werin aktîvkirin û komîteyên jineolojî werin aktîvkirin, rola jinên ciwan di her çalakiyan de werin xurtkirin, piştgirî û destek ji jinên Beyth Nehrên û Sotor-Jin were kirin, rojnameyeke Dengê jinên Suryan were derxistin, xurtkirina aboriya jinên Suryan.”

## Hişmendiya rast wê pêşî li berdana jinan bigire

**Jiyan BOZO/Ronahî-Qamişlo**

Malbat dendika civakê ye û bingehê wê yê sereke ye. Pirsgirêkên di malbatê de derdikevin bandora xwe li civakê tevê dikin. Pirbûna berdana jinan xetereke mezin li ser vê dendikê çêdike. Gelo sedemên wê çi ne û ji bo çareseriya van pirsgirêkan divê çi bê kirin?

**HEVJIYAN AZAD ÇARESERIYA PIRSGIRÊKÊN DI NAVBERA JIN Û MÊRAN DE YE**

Bêguman sedemên berdanê pir in; hem civakî, hem çandî, hem aborî ne û gelek mijarên din jî dibin sedem.
Nefêmkirina di navbera jin û mêran de, dihêle ku pirsgirêk bibin girêkên kor. Di heman



demê de hişmendiya zilamê serdest ku bi çavekî piçûk li jinê dinêre, destdirêjî û lêdanê mefê xwe dibîne, sedema herî mezin ya berdanê ye. Piraniya civakên Rojhilata Navî ku li ser kevneşopiyan çandek ava kirine mafê jinê qebûl nakin. Li gorî wê çandê jin ji bo karê malê, zarokanînê û pêdiviyên zilam e. Vê çandê jineke bêwate, ji cewherê xwe yê xwezayî dûr û mafê xwe nas neke afirandiye. Ev hişmendiya ku modernîteya kapîtalîst nûnertiya wê dike jineke azad û serbixwe qebûl nake. Ji bo wê, jina xwediya fikreke azad û doza mafê xwe dike jib o xwe xeter dibîne. Zilamê bi vê hişmendiyê perwerde bûyî, jina azad qebûl nake û nikere pê re bijî. Ev jî dibe sedema jihevqutbûnê.
Herwiha zewicandina zarokên piçûk ku nikarin ji jiyana hevbeş fêm bikin û mafê xwe biparêzin dibe sedemeke din ya qutbûnê. Hişmendiya ku zewacê ji bo têrkirina daxwaziyên zayendî tenê dibîne pîroziya zewacê dikuje. Herwiha ev dibe sedem ku ezezî pêş bikeve û prensîbên fedakarî û hevtemamkirinê ji holê rabin. Ev jî ji berdana jinan re dibe sedemeke bingehî.
Herwiha yên herî zêde zerarê ji berdanê dibînin jin û zarok in. Hem ji mile pîskolojî hem civakî hem aborî ve êşê dikişînin. Piştî berdanê bi çavekî piçûk li jinê tê nêrîn, di hin civakan de nayê qebûlkirin û ji tevayiya mafê xwe tê tê bêparkirin. Hişmendiyek wiha jinê hildiweşîne û jiyanê lê dike dojeh. Di heman demê de barê wê girantir dibe. Lewre ji zarokên xwe re hem dibe dê hem bav û di mile aborî de jî pir zehmetiyan dikşîne.
Ji bo dernekerina pirsgirêkên bi vî rengî divê zewacke rast û li ser bingehê hevfêmkirin û temamkirinê be. Çimkî jiyana li ser koletiya jinê û serdestiya mêr hatî avakirin dawiya wê jihevqutbûn e. Ji bo vê heşmendiyê divê lêhûrbûneke kûr were kirin û li ser bingehê hevjiyana azad jin û mêrekî zana bi hev re malbateke rast ava bikin. Herwisa divê pirsigirêkên xwe yên jiyanî, bi tayîbetî yên zayendî bi diyalogê çareser bikin. Bi hişmendiyeke wiha hem hevsengî û heskirin çêdibe, hem malbat tê parastin hem zarok tên parastin. Ji malbatên wisa civakeke rast ava dibe.

EW ROJ



Ruhê Serhildana 6-7-8’ê Cotmehê

Farûk SAKIK

Li deverên sîstemên faşîst û rêveberên dîktator hene, li wan deveran bêdengî, tirs û xof parçeyek jiyana mirovan e.
Lê li van deveran roj tê bi yek çirûskek serhildan û îsyan dest pê dikin. Ew rêveberiyên faşîst jî nikarin pêşî li vê pêla ku ji kûrahî û tarîtiyê bilind dibe bigirin.
Li Tirkiyê jî di roja me de sîstemek faşîst û dîktatorek wek Erdogan heye. Ne bi tenê li Tirkiyê û li Kurdistanê, li hemû cîhanê bûye bela serê mirovahiyê. Li kêleka wî hin çeteyên selefîst, ji deverek derbasî deverek dinan dibin. Li du hin xeyalên kalikên xwe Enver Paşa yên Tûranîzmê bû. Dixwest ku ev xeyalên pêk nehatine ew temam bike.
Bi destpêka şerê Sûrî wî jî êrişî Kurdistanê kir. Êrişî Rojava kir. Riya wan xeyalan li ser xaka Kurdistanê derbas dibûn.

Di wan rojan de bi êrişên DAIŞ’ê li Kurdistanê nezelaliyek hebû. Her tişt dema ku çeteyên DAIŞ’ê êrişî Kobanê kirin û Erdogan, li Islahiyê got; “Va ye Kobanê li ber ketinê ye, wê bikeve” dest pê kir.
Li bakurê Kurdistanê di 6’ê Cotmehê de serhildan dest pê kir û di 3 rojan de li her deverî belav bû. Kobanê têk neçû DAIŞ têk çû.
Ev têkçûna DAIŞ’ê li gel Erdogan wek birînek ma. Qalikê vê birînê 6 sal şûnde ji nû de rakir û bi du tola wê serkeftina kurdan ket.

Serhildan ji Bakur dest pê kiribû wî jî ji wê derê dest pê kir. Êrişî HDP’ê kir û hincet jî serhildana 6-7-8’ê Cotmehê nîşan da. Der heqê gelek rêveber û parlementerên HDP’ê yên wê demê de doz hatin vekirin û hatin zîndankirin. Dîsa heman Erdogan di 2’yê Cotmeha 2020’an de di axaftinek xwe de behsa dagirkirina Rojava kir. Xeyalên wî yên dagirkirina Kobanê ji nû de anî rojevê. Ev car wê kîngê û çawa êriş bike nayê zanîn. Wê hêzên navnetewî helwestek çawa nîşan bidin nayê zanîn. Lê em vê yekê baş dizanin rihê serhildana 6-7-8’ê Cotmehê li Kurdistanê belav dibe û wê Erdogan qedera DAIŞ’ê ya li Kobanê bijî.

Kurdan pêngavek serkeftinê nû dane destpêkirin. Û pengav wek “pêngava encam girtinê” pênase kirin. Li her aliyê Kurdistan roj bi roj ev berxwedana nû belav dibe. Vê care bi israr in wê encamê bigirin.

Berî ku serhildana 6-7-8’ê Cotmehê dest pê bike Rêber Ocalan bi peyamek ji kurdan xwestibû ku li Kobanê xwedî derkevin û li dijî DAIŞ’ê şer bikin. Kurdan ev yek wek fermanek dîtibû û li bakurê Kurdistanê bi sed hezaran kes bi dirûşma ‘Her der Kobanê her der berxwedan e’ serhildana 6-7-8’ê Cotmehê dabûn destpêkirin.
Faşîzma AKP’ê îroj dibîne ku bi vê pêngava nû, wê rihê serhildana 6-7-8’ê Cotmehê ji nû de serhildanek bidin destpêkirin, di destpêkê de tecrîd şidandin. Bi biryarek 6 meh hevdîtina Rêber Ocalan a bi parêzeran hat qedexekirin. Dema ku faşîzma AKP’ê di tecrîdê de israr kir, kurdan jî di qada navnetewî de “kampanya azadiya Ocalan” dane destpêkirin. Ne bi tenê kurd, li her deverên cîhanê kesên fikir û ramanên Ocalan bihîstibûn tevlî vê kampanyayê bûn. Ocalan wek pêşengê azadî û aştiya serdemê didîtin. Êdî ne bi tenê ji bo şikandina tecrîdê têkoşînek ji bo azadiya Ocalan dane destpêkirin. Ev têkoşîna bi rihê serhildana 6-7-8’ê Cotmehê dest pê kiriye wê bi ser keve.

# Berdevkê Karê Derve yê KCKê: Nûçeya 'Gerîla li Ermenistanê şer dikin' derew e

**Berdevkê Komîteya Têkiliyên Karê Derve ya KCK'ê Serdem da zanîn ku agahiyên tên belavkirin ku hêzên gerîla li Ermenistanê şer dikin derew in.**

Berdevkê Komîtya Têkiliyên Karê Derve yê KCK'ê Ronî Serdem, bertekeke hişk nîşanî dewleta Tirkî ya dagîrker da bi şandina çeteyan ya Azerbeycanê, şerê Azerî-Eremnî da destpêkirin, dîsa têkildarî nûçe û agahiyên şervanên Tevgera Azadiya Kurdan ya ji bo li Eremenistanê şer bikin çûne Ermenistanê belav dikin, da.
Berdevik Ronî Serdem li ser navê Komîteya Têkiliyên Karê Derve a KCK'ê ji ANF'ê re axivî û diyar kir ku dewleta Tirk a derewan par ve dike, alîgirên AKP'ê bixwe jî bawer nakin.
Serdem diyar kir ku dewleta Tirkî li ser bingehê teşwîq, amadekarî û planê li xeta Qafqasan eniyeke şer a nû vekiriye û wiha got: "Destpêkê ne alîgir û ne jî yên destpêkê ev şer dayîn destpêkirin ne gelê Ermenî û ne jî Azerî ne. Rewşa ku weke şerê Azerbeycan-Ermenistan tê navkirin; di rastiyê de şerê dewleta Tirkî ye, parçeyek ji projeya Osmanî û armancên wê ne. Rêveberên AKP'ê berî niha ku nexşeya servîs kiribû ev qad li xwe girtibûn dema li ber çavan bê girtin, wê rewş hê baştir bê famkirin."
Dewleta Tirkî ya di dîrokê de û heta niha qirkirinê bi serê gelan tîne, ji ber van polîtîkayên nîjatperest û faşîst, Kurd, Ermenî, Rûm, Asûrî-Suryanî û gelên din dijmin dîtine û êrîş kirine. Bi taybet di salên dawî de, hişmendiya faşîst a AKP-MHP'ê ya ku hema bêje serê her mehê dibe sedemê avakar û krîzên navneteweyî li serê hemû gelên cîhaê bûye bela.
Dem hatiye ku êdî ji rejîma Tirkî a şer dibe her cihî, nearamniyê çêdike, dibe sedemê dagirkeriyê hatiye. Dem hatiye ku êdî mirov ji vê rejîma Tirk a faşîst û




hezxwazê şer rizgar bibe. Dem hatiye ku êdî rejîma faşîst a AKP-MHP'ê bê hilweşandin. Dem hatiye ku mirov ji dagirkerî û şerxwaziya dewleta Tirkî re bêje 'rawest e'. Bang li hemû gelan û hêzên demokrasiyê dikin ku li dijî polîtîkayên şerxwaz, şer û nîjatperestiyê bibe xwedî helwestên zelal."

## MSD`ê li Reqayê panela xwe ya duduyan li dar xist



Di panela 2. ya MSD'ê ya li bajarê Reqayê de ku li bakur û rojhilatê Sûriyê ya 6an e, beşdaran bi duruşma"Ji bo welatiyên Cizîrê û Firatê ber bi kongreyeke neteweyî ve" bal kişnd ser girîngiya çareseriya siyasî û bidawîkirina êşa gelê Sûriyê.
Panel li hola civînan a Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya Reqayê li dar ket. Seroka Desteya Rêveber a Meclisa Sûriya Demokratîk Îlham Ehmed, Cîgirê Desteya Serokatiya MSD`ê Hikmet Hebîb, Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdulhemd El-Mihbaş, rûspiyên eşîrên Reqayê û kesayetên siyasî beşdarî panelê bûn.
Panelîstan bal kişand ser rêzegên bingehî yên parastina mafên welatibûnê û mafên pêkhateyên Sûriya yekgirtî, xurtkirina beşdariya ji saziyên Rêveberiya Xweser ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêşxistina Rêveberiya Xweser û ya Sivîl. Ev mijar di nava du xalan de hatin nîqaşkirin.
Di mijara yekemîn a panelê de diyaloga Sûrî-Sûrî, diyalogên bi muxalefetê, rejîmê û Kurdî-Kurdî û bandorên wan li çareseriya siyasî hate nîqaşkirin. Cigirê Desteya Rêveber ê MSD`ê Hikmet Hebîb axivî û da zanîn ku MSD` heta dawiyê girîngiyê dide çareseriya aloziya Sûriyê ya bi alî û hêzên Sûriye pêk ve re.
Hebîb got ku hin diyalogên wiha ji ber destwerdanên hin hêzên siyasî yên ji derve hatin astengkirin, ji ber çareseriya aloziya Sûriyê ji bo berjewendiyên wan gaveke neyinî ye, nexasim ji bo Koolîsyonê/Îtîlavê ku rasterast bi artêşa Tirk ve girêdayî ye.
Têkildarî diyalogên bi hikumeta Şamê re, Hikmet Hebîb piştrast kir ku hewldanên lidarxistina diyalogan hikumeta Şamê jî digire nava xwe, lê tevî ku hin komîte hatin avakirin û dest bi karên xwe kir bi ser neket, ji ber hikumet hîn jî çareseriya ku dawî li aloziyê tîne berdewam nekir û hişmendiya wê ya navendî ev diyalog red kir.
Hikumet Hebîb bal kişand ser diyalgoên Kurdî-Kurdî û got: "Ev diyalog li gorî hesabên aliyên Sûriyê yên din pêk nehat, lê belê ji bo garantiya yekitiya neteweyî û parastina çareseriya aştiyane ku serketinê qezenc dike pêk hat."Di mijara duyemîn a panelê de behsa têkiliyên dîrokî yên di navbera gelê herêmê de û rola wan di avakirina Rêveberiya Xweser, mekanîzmeya pêşxistina beşdariya ji saziyên Rêveberiya Xweser de hate kirin. Di vê rojevê de Hevserokê Meclisa Rêveberiya Xweser Abid Hamid El-Mihbaş axivî û behsa têkiliyên dîrokî yên di navbera pêkhateyên Sûriyê de kir ku hin hêzên herêmî hewldana derxistina fitneyan dikir.
Abid Hamid El-Mihbaş di nava axaftina xwe qala qonaxên avakirina Rêveberiya Xweser û Sivîl kir û destnîşan kir ku piştî saziyên hikumeta Sûriyê ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekişiyan, ji bo rêvebirina kar û barên civakê ev rêveberî hatin avakirin û parastina herêmê ji çeteyên DAIŞ`ê kirin û paşê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate avakirin.
El-Mihbaş di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser serketinên saziyên Rêveberiya Xweser tevî zor û astengiyên artêşa Tirk û komployan bidestxistine.
Piştî wê deriyê nîqaşê li pêşiya beşdaran hate vekirin û tê de nîqaşa qoxanên diyalogên bi hikumeta Şamê, girîngiya çareseriya siyasî ku gelê Sûriyê zehmetiya wê dikişînin hate kirin.
Berî ku panel bi dawî bibe beşdaran ji bo saziyên Rêveberiya Xweser pêşniyar kirin.

## Metirsiya Komkujiyên 1915'an Li Ber Çavan E



**Idrîs Henan**

Nagorno Karabax ango Erdsax; herêmeke çiyayî li koşeya rojavayê Azarbîcan û rojhilatê Ermenistanê ye. Di bîsteka sedsala borî de, herêmeke nişteciyên wê kurdên êzîdî û ermenî bû. Di serdema Lenîn de yekemîn komara Kurdistana Sor li ser ava dibe. Lê bi hatina Stalîn re û ji ber berjewendiyên petrolê bi Îran û Tirkiyê re gelên Kurdistana Sor qir dike û mişextî Sîbîryayê dike ku rêjeya bilind ji şêniyan li ser rêya mişextiyê jiyana xwe ji dest didin. Bi vî awayî Kurdistana Sor di salên 1923'an de tevlî sînorên Azarbîcana îro dibe û herdu gelên Kurd û Ermen li wê herêmê têne qirkirin. Stalîn jî bi rêbaza togayên sultanê Osmanî Abdulhemîd tovên nakokî û kêşeyan li wê herêmê diçîne ku serweriya xwe misoger bike. Ji lew re ji wan salan û heya roja me ya îro pirsgirêk û nakokiyên li wê herêmê ji ber mudexeleyên Îran û Tirkiyê dewam dikin ku îro bi şiklê şer û pevçûnan teqiyane.
Di salên 1988'an de tovên hevçûn û dijatiyê di navbera herdu welatan de diteqe û bi veqetîna ji Sofyetan hevçûna herdu welatan digihe lûtkeyê. Parelelî hevçûna herdu welatan herêma Nagorno Karabax serxwebûna xwe radigihîne. Hikûmeta Azarbîcanê qebûl nake û êrişî herêmê dike û şer dest pê dike. Di wî şerî de, li gorî deteyên bi raya giştî re hatine parvekirin, zêdetirî 30 hezar ermenî û azarî jiyana xwe ji dest didin. Lê bi şer re hinek rastiyê demografîk û cografîk ên nû derdikevin pêş; di encama şer de pêla koçberiya etnîkî navbera herdu welatan de dest pê dike û li herêmê serweriya etnîkî ya ermenî çêdibe. Ango hindikayiyên azarî ku li herêmê jiyan dikirin jî reviyan Azarbîcanê û berovajî wê jî rast e. Konseya Ewlekariyê ya NY di sala 1993'an de biryara rawestandina şer dide. Sala 1994'an jî agirbest tê ragihandin û wisan kêşeyan herdu welatan bê destwerdanek cidî ya navneteweyî heya roja me ya îro dewam dike. Di vê pêvajoya agirbestê de, di encama mudexeleya rasterast a Tirkiyê û bêdengiya Rûsyayê de, gelek caran artêşên herdu welatan li hev dikevin û bi dehan şênî jiyana xwe ji dest didin. Diyar e dewlemendiya Azarbîcanê ya gaz û petrolê gilêza Rûsyayê herikandiye ku di pêşbirka çekdarîbûnê bi Ermenistanê re bi ser dikeve. Ermenistana ku sînorên wê yên bi Tirkiyê û Azarbîcanê re girtîne, gelek kêşeyên aborî jiyan dike. Lê bi serweriya li ser bilindahî û çiyayên stratecîk yên li dora herêmê, di têkîliyên bi Rûsyayê re vediguhere hevlabendek pêbawer. Armanca Rûsyaya îro ne dûrî armancên Stalîn in. Ew jî dixwaze bi heman rêbazê ku herdu welatan bi çek dike, parastina serweriya xwe ya leşkerî û siyasî li herêmê bixe bin garantiyê. Rûsya baş têdigihêje girîngiya herêmê ya ceosiyasî. Ji ber girîngiya cografîk a herêmê ku herdu xetên gaz û nefta ku diçe Ewrûpa têre derbas dibin, helwesta Rûsyayê pasîf e. Ewrûpa dixwaze ji bin barê enerjiya Rûsya derkeve û çi şerekî mezin li wê herêmê biqewime dê projeyên xetên gazê yên pêşerojê xira bike. Tirkiyê bi sloganên nijadperest ên etnîsîteyî hewl dide gaza Azarbîcanê weke altirnatîf li dijî hegemoniya Rûsyayê bi kar bîne. Tevî ku di Tirkiyê de tu jêderên gaz petrolê nînin, lê sûdê ji şûngeha xwe ya cografîk digire ku ji bo Ewrûpa bûya xeta transit.
Hewl dide hemû enerjiya ku diçe Ewrûpa di nav Tirkiyê re biherike û li gorî wê jî şertên xwe yên siyasî û aborî li ser Ewrûpa ferz bike. Ji lew re em dikarin nakokiyek nû li têkîliyên Tirkiyê û Rûsyayê li vê herêmê, piştî Sûriyê û Lîbya zêde bikin.Îro jî Tirkiyê bi rêbazên komkujî û qirkirinên li dijî Ermen, Asûr û Kurdan mudexeleyî Qoqazê dike û çawa ku li rojhilatî behra Spî, Sûriyê û Lîbyayê dike hewl dide li wir jî bike. Di bin manşêtên nijadperest ên Erdogan de, hewl dide kirîzên xwe yên desthilatdariyê, siyasî û aborî bi rêbaza cînosîdê derbas bike û di nexşeya nû ya herêmê de mîrata Osmanî bivejîne. Lê ev çiqas gengaz û derferdar e, mejarek mewzubehs û girêdayî pêşketinên pêşeroja nêz e?



# PYD civînên bi gel re didomîne

**PYD civînên xwe yên nirxandina geşedanên siyasî bi gel re didomîne. Li navçeya Qenaya ya rojavayê kantona Kobanê civînek li dar xist.**

Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) di çarçoveya pêngava "Bes e dagîrkerî, dem dema şoreşê ye" de, civînên xwe yên bi gel re didomîne.
Bi beşdariya bi sedan şêniyên navçeya Qenaya ya rojavayê kantona Kobanê, endama Koordînasyona Kongreya Star ya herêma Firatê Rewşen Hacim, Hevserokê Desteya Hundirîn a Herêma Firatê Bozan Xelîl, Hevserokê Meclisa Leşkerî ya Kobanê Îsmet Şêx Hesen civînek li dar xistin.
Bozan Xelîl axivî û got, "Xuya ye ku şerê Sûriyê ber bi dawiyê ve diçe, lê ev li ser hesabê gelê Sûriyê ye ku fatoraya pêkanîna armancên dewletên lîstikvan ên Sûriyê didin."
Xelîl banga parastina destkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê kir û wiha diyar kir: "Em pêkhateyên herêmê ji me hemûyan tê xwestin ku bi berpirsyartî tevbigerin û destkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê biparêzin, ji ber ku gel wê çarenûsa xwe diyar bike. Dem dema berxwedana gelan e."
Îsmet Şêx Hesen jî wiha axivî: "Bi hêz û îradeyê em gihiştin vê astê. Dijmin bi hemû rêbazan hewl da îradeya me bişkîne lê bi ser neketin."
Şêx Hesen banga hevgirtinê li gelên herêmê kir "Divê gel hevgirtî be û yek bin. Dijmin hewl dide fitneyên mezhebî li herêmê derxîne, mînaka herî berbiçav, qetilkirina şêx û rûspiyên Dêrazorê ye û em bi qetilkirinê tawanbar kirin, ji ber



ku em xwediyê projeya biratiyê ne û ne sûcdar in."
Îsmet Şêx Hesen amaje bi giringiya berxwedanê kir û got ku rêya tekane ya pêkanîna armancên gelan di jiyaneke azad û bi rûmet de ye.

## Bi merasimeke girseyî şehîd Şaha hat veşartin

Bi hezaran şêniyên Dêrikê û navçeyên wê cenazeyê fermandara Tevgera Rizgariya Kurdistanê Şaha Dêrikê ya bi nexweşiyê şehîd bûyî, li goristana Şehîd Xebat Dêrik veşartin.

Welatiyan cenazeyê şehîd Şaha Hisên (Şaha Dêrik) ji nexweşxaneya Dêrikê girtin û bi karwanekî wesaitan ber bi goristana Şehîd Xebat Dêrik ve ketin ser rê.
Di merasima li goristanê de endama Koordînasyona Kongreya Star Hêva Erebo sersaxî ji malbata şehîd Şaha û Tevgera Rizgariya Kurdistanê re xwest.
Hêva Erebo got, "Şehîd Şaha 30 salan di nava Tevgera Rizgariya Kurdistanê de têkoşiye û mîraseke têkoşînê ji gelê xwe bi taybetî ji jinan re hişt."
Di merasîmê de, Hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya




Xweser a Herêma Efrînê Şîraz Hemo jî wiha got: "Şehîd Şaha mohra xwe li cem gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî li cem şêniyên Efrînê û Şehbayê hişt ku bi giyanê wê yê têkoşer ve hatibûn girêdan."
Piştî axaftinan nasnameya şehîd Şaha hat xwendin û radestî malbatê hat kirin. Malbatê soza şopandina xeta şehîdan da. Cenazeyê şehîd Şaha di nava durişman û tilîliyên dayîkan de hat veşartin.

## Çete di ser Efrînê re diçin Azerbeycanê

Rêxistina Mafên Mirovan ya Efrîn-Sûriyê diyar kir ku artêşa Tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li Efrînê dibistan kirine baregeh û navendên komkirina çeteyên Sûriyê da ji wir bişînin Libya û Azerbeycanê.

Berdevkê Rêxistina Mafên Mirovan ya Efrîn- Sûriyê Îbrahîm Şêxo da zanîn ku artêşa Tirk navend û dewreyên perwerdeyê ji bo çeteyên "Artêşa Niştimanî ya Sûriyê" vedike da wan bişîne Azerbeycanê da li dijî artêşa Ermenistanê şer bikin.
Îbrahîm Şêxo diya kir ku dewleta Tirk berê komên çete bi awayekî veşartî û dûrî dezgehên ragihandinê dişandin Azerbaycanê. Bi sedan çeteyên Sûrî ji bo Azerbaycanê hatin şandin û di di demeke kurt de di şerê li Qerebaxê de hatin kuştin."
Şêxo ku agahiyên xwe spartine çavkaniyên taybet, diyar kir ku



ji çeteyên El-Cebha El-Şamiyê derdora 370î di şer Azerbeycan û Ermenistanê de hatin kuştin.
Îbrahîm Şêxo got, li gorî çavkaniyên taybet ên rêxistinê, "Dibistana amadeyî ya Emîr Xubarî ya li navenda bajarê Efrînê bûye navenda komkirina çeteyan û şandina wan ber bi Lîbya û Azerbaycanê ve. Dibistan bûye baregeheke MÎT'ê. Herwiha dibistana Ezhar Efrîn a navenda bajar ku baregeha leşkerî ya MÎT'ê ye bûye navenda kombûna çeteyan."

## Tirkiye ji bo Rojhilata Navî û herêmê çavkaniya xeterê ye.



**Zekî BEDRAN**

Dewleta Tirkî ji bo gelên herêmê bûye çavkaniya metirsiyê. Beşeke girîng ya Sûriyê dagîr kiriye. Li Libya bûye aliyekî şer û bi çeteyên xwe gefê li welatên derdor dixwe. Ji bo wê Misir û welatên din neçar mane tevlî şer bibin. Rojane êrişî Iraqê dike. Bi dehan baregehên leşkerî ava kirine, herêmên nû dagîr dike û jimara leşkerên xwe zêde dike. Niha jî bi êrişa Ermenistanê re şerê agirekî nû pê xist. Li Derya Spî bi gefxwarina li Yewnanistanê qeyranê kûrtir dike. Bi kurtayî di serî de Rojhilata Navî ji bo welatên herêmê bûye bela. Ji ber mijara Qerebaxê bi dehê salan e di navbera Azerbeycan û Ermenistanê de nakokî dewam dike. Lê ti caran weke îro şerekî wiha giran û êriş çênebûne. Li ser navê Azerbeycanê êdî Erdogan diaxive. Dibêje, heta Qerebax neyê standin wê şer nesekine. Bi êrişa ser HDPê di hundir de jî şer didomîne. Ango hem li dundir hem li derve bi şer û aloziyê siyasetê dike.
Erdogan canê gel û mirovan weke pereyan bi kar tîne. Bi hişmendiyeke faşsît her tim şidetê diafirîne. Diyar e ku wê li Ermenistan û Azerbeycanê bi hezaran mirov bimirin, bi hezaran seqet bimînin û bi sedhezaran ji ciyê xwe bibin. Gund û bajar wê wêran bibin û qada jiyana mirovan tine bibe. Wê wêraniya mirovî û civakî piralî be. Ev ne qeder in, ne mecbûrî ye ku bibin jî. Pirsgirêkên bi diyalogê çareser bibin ji bo AKPê û Erdogan rêbaza şidetê bûye rêbaza siyasetê Erdogan bi aborî, çand û zanistê nikare bibe mûxatebê gelan. Aboriya wan roxiyaye. Hişmendiya wan jî qirkirina gelan e. Ji bo wê serî li faşizm û şer didin. Ji bo ku bide şerkirin û bişîne mirinê di destê wî de ciwanên Sûrî jî hene. Dinyayê tevê destê xwe ji komên çekdar yên weke DAIŞ û El Nusra kişand. Lê Erdogan û Tirkiyê çete tev xistin binê baskên xwe. Bi çend qurûşên meaş li Libya, Sûriye û niha jî Azerbeycanê wan dişîne mirinê. Van çeteyan nasnameya xwe ya siyasî winda kiriye, ji hişmendiya yekîtiya bi gelê Sûriyê re dûr ketine, şer kirine ciyê debara aborî û bûne koleyên Erdogan.
Hikumeta Şamê jî li şûna ku bi gelê xwe re haşt bibe, reformên demokraktîk bike, di hişmendiya Baasê û navendîriya hişk de israr dike. Ji ber wê ji bo kesên weke Erdogan zemînê mûdaxeleyê derdikeve. Parçebûna Sûriyê karê faşîst û dagîrkerên weke Erdogan hêsan dike. Erdogan Idlib ji leşkeran dagirt. Bi guhertina demokrafiyê li herêmên weke Efrîn û Serê Kaniyê amadekariya ilhaqê dike. Niha jî bi şandina hêzên nû ya ser sînor ji bo dagîrkeriyên nû gefan didêre. Radigihîne ku li hemberî rejimê artêşeke alternatîf ava kiriye. Çawa ku xwediyê Sûriyê be tev diğere. Polîtîkaya Emerîka û Rûsya jî derfetê didin û Erdogan planên xwe pêk bîne. Ev dewlet ku bixwazin dikarin Tirkiyê bisekinînin. Qada hewayî ya Sûriyê di destê wan de ye. Eger qada hewayî venekin nikare tiştekî bike. Gel bi vî awayî dibin goriyên bazara qirêj û bidizî. Ku rewş wisa dibe faşizm xurt dibe û belav dibe.
Erdogan şer, amûrê mayîna li desthilatiyê û weke Osmaniyan bidestxistina xenîmeta aborî dibîne. Aboriya Tirkî li ber iflasê ye. Li Libyayê hemleya xwegihandina petrolê valakirina xezîneya wir kir. Niha jî li Azerbeycanê heman tiştî dike. Herî kêm wê bixebite ku rêveberiya Aliyev bixe nava şer, muhtacê xwe bike û çend milyar dolarî bi dest bixe. Ji bo bidestxistina petrol û gazê jî wê serî li lîstikan bide. Gotina "Azarbeycana bira" yan jî Sûriyeya cîran sirf ji bo veşartina rûyê xwe yê qirêj bi kar tîne. Her tişt ji bo berjewendiyên madî û têkûzkirina desthilatiyê ye. Erdogan eşkere dibêje ezê dîsa êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê bikim. Ji bo wê gelên Sûriyê bê ku dev ji paşroja xwe ya azad û demokratîk berdin, erkekî wan yê dîrokî ku yekîtî û ûwelatê xwe biparêzin. Eger gel xwe birêxistin bikin û li ber xwe bidin dagîrker bi ser nakevin. Erdogan çawa ku dixebita bi aloziyan li ser piyan bimîne û j aloziyan sûdê bigire, dibe ku terse wê jî bibe. Eger gelên gerêmê û yên li Sûriyê dijîn ji bo derkirina vê belayê bibin yek û berxwedanê birêxistin bikin wê Erdogan serberjêr bikin. Hêza dagîrkeran ne bêdawî ye. Berî her tiştî neheq in. Zalim in û ev erd ne yê wan e.